# SÛRÎYE | SYRIA

TIER 1 | USCIRF-RECOMMENDED COUNTRY OF PARTICULAR CONCERN (CPC)

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF), encûmeneke hikûmeta federal a DY-yê ya cotpartîyîyî ya azad e ku bi Qanûnê Azadîya Dînî ya Navneteweyî (IRFA)ya 1998ê sazkirî ye û çavdêrîya mafê azadîya dînî û bawerîyê ya cîhanî ya derveyê welêt dike. USCIRF ji bo çavdêrîya binpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê standardên navneteweyî bi kar tine û ji Serekê Dewletê re, Wezîrê Karên Derve re û Kongresê re pêşnîyarîyên siyasî pêşkêş dike. USCIRF dezgeheke azad e ku ji Wezîrîya Karên Derve cuda tevdigere. Raporta 2019ê ya Çalakîyê bibelgekirina binpêkirinên li ser rûyê cîhanê û ji alîyê pêşnîyarîyên siyasî yên azad ji bo hikûmeta DY ve karên salekê ya koma profesyonel û Endamên Encûmenê bi awayekî herî bilind eşkere dike. Raporta 2019ê ya Çalakîyê, dewra nava Çileyê Paşîn ê 2018ê heta Çileyê Pêşîn ê 2018ê dixe nava xwe, lê di hin rewşan de bûyerên giring ên piştî vê dewrê jî dixe nava xwe. Ji bo zanîna bêtir a li ser USCIRF-ê hûn dikarin ji vê derê serdana sîteya înternetê bikin yan bi rêya jimara 202-523-3240ê ya têlefonê yekser xwe bigihîninê.

**Sûrîye**

**Bidestketîyên Hîmî:** Di sala 2018ê de li Sûrîyeyê rewşa azadîya dînî her wek sala berî wê neyînî bû. Wek encameke dînamîkên tevlîhev û mezhebî yên şerê hundirî yê li welêt dewam dike; bêtirî 500 hezar kes mirine û bêtirî 12 milyon kes jî cîh guherandine. Dewleta Îslamî ya Îraqê û Şamê (DAÎŞ), her çend wekî ku axa di sala 2017ê de li Sûrîye û Îraqê bi dest xistibû hema hema bi temamî ji dest dabû jî, di seranserê sala 2018ê de li çendîn herêmên Sûrîyeyê hebûna xwe bi awayekî xuyayî lê hinbihin kêmbûyî dewam kiriye. Kirinên xwe yên wek gefxwarina li kêmanîyên dînî û komên Misliman ên bi îdeologîya xwe, wek wan bi Îslamîyeta radîkal tevnagerin û bikaranînê şiddeta li dijî wan dewam kiriye. Di heman demê de Heyeta Tehrîra Şamê (HTŞ) di dema dawî ya raportkirinê de di serî de li Eyaleta Îdlîba ew hema hema li dijî komên dijber tê de bi ser ketibû, li bakurê rojavayê welêt, hebûna xwe bi awayekî mezin bêtir kiriye. Tevlî binpêkirinên berfireh ên mafên mirovan, HTŞ, di axa destê xwe ya hinbihin firehbûyî de li kêmanîyên dînî yên lê dijîn zordestîyê kiriye, li gora danzanînan; bi zorê dest danîye ser warên malbatên Fileh û hin awayên din ên şiddeta mezhebî pêk anîne. Hêzên hikûmeta Sûrîyeyê, tevlî desteka giring a hevkarên xwe yên Ûris, Îranî û Libnanî, bêtirkirina kontrola xwe ya li ser beşekî giring î welêt a berê di destê hêzên dijber de bû dewam kiriye. Hêzên çekdar ên hevkar yan hevalên rejimê di vê proseyê de, ji ber destekên wan ên yekser yan texmînî, komên Misliman ên Sinnî bi awayekî eşkere ji xwe re kirine dijber, siza dane û bi wan re şer kirine. Hêzên serhildêr ên ji alîyê Tirkîyeyê ve destekkirî, li bakurê Efrînê rawestandineke şerî ya bi navgînîya Neteweyên Yekbûyî (NY) bi nebaşî bi kar anîne û li wê herêmê zordarîyê li kêmanîyên dînî û nîjadî kirine û cîhên wan guherandine. Kêmanîyên dînî û nîjadî yên li herêmên di destê Kurdan de ne; li bakurê rojhilatê welêt dijîn, li wan deran azadîya dînî bi tevahî hema hema pirr bêtir be jî, li ser biryara di paşîya 2018ê de li ser encama proseya vekişîna hêzên DY

ya ji bakurê rojhilatê Sûrîyeyê endîşeyên wan bêtir bûye. Di nava van endîşeyan de êrîşa dijwar a Tirk a li dijî hêzên Kurd û bivênevêyîya dîsa xurtbûna DAÎŞê jî hebûn.

Tevli komên wek DAÎŞ û HTŞ-ê yên ku DY ew wek terrorist bi nav kirine, ji ber binpêkirinên dijwar ên komî, daîmî û hê jî dewam dikin ên hêmanên Îslamîyên radîkal ên dijberîya Sûrîyeyê û rejima Esedî û hevkarên wê, USCIRF, di çarçoveya Qanûnê Azadîya Dînî (IRFA)yê de di sala 2019ê de wek "welatê taybet ê endîşebar (CPC)" hêjayî binavkirinê qebûl kiriye. USCIRF, ji bilî van, her çend kontrola DAÎŞê ya dewamî kêm bibe jî, li ser rewşa çarçoveya ji nû ve xurtbûna tevlî ya sala 2018ê, di çarçoveya guherînên di Çileyê Pêşîn ê 2016ê de pêkhatî yên di qanûnê IRFA-yê de ji ber binpêkirinên azadîya dînî, DAÎŞ hêja ye ji nû ve wek "dezgeha taybet a endîşebar" (EPC) were binavkirin. USCIRF ji bilî van, li ser rewşa 2018ê ya tevlî kontrola HTŞ-ê ya li herêmê, ji ber binpêkirinên azadîya dînî ya vê dezgehê ew hêjayî binavkirina wek EPC-ê dîtiye.

**Pêşnîyarîyên ji Hikûmeta DY re**

- Li gora rewşên Qanûnê Xelaskirin û Berpirsîyarîya Tovkujîya Îraq û Sûrîyeyê yê 2018ê (P.L. 115-300) bi awayekî demildest û bibandor bi kêmanîyên dînî û nîjadî yên bêparastin re û li gora Qanûnê Elie Wieselê yê Nehiştina Tovkujîyê û Zordarîyê (P.L. 115-441) kirina alîkarîyê û bi bikaranîna jêderên xuyandî, di serî de yên li bakurê Sûrîyeyê nehiştina sosrethatina serê van koman;

- Bi awayekî bê bandoreke nebaş a li ser maf û hebûna kêmanîyên dînî û nîjadî, teqezkirina pîlana hêzên DY ya vekişîna ji bakurê rojhilatê Sûrîyeyê;

- Parastina tevlîkirina nûnerên birêvebirîya xweser a bakurê rojhilatê Sûrîyeyê ya bi pirranî Kurd in a li herêma xwe belavbûyîna azadîya dînî destek kirine tevlîbûna wan a encûmena bi serektîya NY ya ji bo ji nû ve nivîsîna qanûnê esasî yê Sûrîyeyê hatiye wezîfedarkirin;

- Bi rêya dezgehên NY yên têkildar, dezgehên civata sivîl (DCS) û nîvekarên bi heman bîr û bawerî yên Hevkarîya Cîhanî ya li Dijî DAÎŞ-ê, li bakurê rojhilatê Sûrîyeyê yê di destê Kurdan de, peredayîn û birêvebirina bernameyên di nava dînan de xweşbînîyê destek dikin, tengijînên mezhebî kêm dikin û qedirgirtina azadîya dînî û mafên têkildar destek dikin; û

- Tevlî nirxandineke ewlehîyê ya bi rêk û pêk û bi awayê pêşîktîdayîna qurbanîyên DAÎŞ-ê û komên kêmanîyên dînî, dewamkirin û li Dewletên Yekbûyî pêşîktîdayîna bicîhkirina bextxwazên Sûrîyeyê.

**Serbuhurî**

**Sûrîye**
**Navê Temamî:** Komara ‘Ereb a Sûrîyeyê
**Hikûmet:** Komara Biserek, rejima gelek otorîter
**Nifûs:** 19.454.263
**Dîn/Bawerîyên Dewlet Ew Nas Kirine:** Îslam (Sinnî/Şî’î), Filehtî, Cihûtî, Durzîtî
**Demografîya Dînî*:**
%87 Misliman (%74 Mislimanên Sinnî; %13 ‘Elewi, Îsmaîlî, Mislimanên Şî’î)
%10 Fileh (tevlî Ortodoks, Katolîkên Rojhilatî û Nestûrî)
%3 Durzî
%<1 Cihû (li dora Şam û Helebê gelek kêm mane), Êzîdî û yên din

***Texmîn, ji Pirtûka Rastîyên Dinyayê ya CIA-ê û Wezîrîya Derve ya Emerîkayê hatine sitandin.

Ji dema ku serekdewletê berê Hafiz Esedê ku bi derbeke Be’sî ya 1970î bû desthilatdar û pê de, malbata Esedî Sûrîyeyê bi rê ve dibe. Beşar Esedê kurê wî piştî mirina wî, di sala 2000î de bû serekdewlet. Esed, bi koka xwe ji Nuseyrîyan e ku ew rehek ji Îslama Şî’î ne û hema hema %13ê nifûsa Sûrîyeyê ji wan in. Ji desthilatdarîya malbata Esedî û pê de, ew, Nuseyrîyan tevlî beşên ewlehîyê, îstîxbaratê û eskerîyê, di cîhên giring ên rejima Be’sê de bi cîh kirine. Digel ku her du rejimên Esedî desthilatdarîyeke xurt lê bê aram li ser komên cûrbecûr ên dînî û nîjadî pêk anîbin jî, bi mebesta bicîhkirina kontrola xwe ya siyasî û ekonomîk, ji bo pêkanîna girêdanên strategîk, bi malbatên Misliman ên Sinnî û desthilatên dînî re dehên salan xerc kiriye. Ji bilî van, bi serbesthiştina perestinên Filehan, Durzîyan û komên din ên nemisliman û destûrdayîna ji jîyana wan a dînî re desteka wan sitandiye lê Sosyalîzma ‘Erebî ya gelek otorîter û nîjadperest bûye sebebê zordarîya binavkirina Kurdan, Asûrîyan û komên din ên ne ‘Ereb.

Piştî ku ev dengeya hessas a nasnameyên nîjadî û îdeologîk bi dehê salan dewam kir, di proseya bêtirbûna serhildanên komî yên Rojhilata Navîn de, di serê sala 2011ê de êdî pelişîye. Her çend xwenîşandanên li dijî rejimê yên serê Adara 2011ê li welêt belav bûbûn bi pirranî bê şiddet bûn jî, hikûmeta Esedî li dijî vê tevgera aştîyanî bi tundî raperikî, di vê navberê de hişt ku komên serhildêr ên çekdar bibin serwerê serîhildanê û di paşîya heman salê de ev awa bû şerekî berfireh. Ji alîyekî ve jimar û nasîna hêzên dijber bêtir bûye û cûrbicûrîya wan a îdeologîk jî bêtir bûye: Hin leşkerên ku dema di sepeya Sûrîyeyê de wezîfedar bûn alîyê xwe guhertine, pêşî bûne serek û şervanên hin komên sekuler ê serfiraz lê di çarçoveyeke fireh de şervanên Îslamî jî zûzûka peyda bûne. Sepeya Sûrîyeya Ereb (SSE) tevlî Hêzên Parastina Neteweyî (HPN), Sepeya Parêzkarên Şoreşa Îranê (SPŞÎ), Hîzbullaha Libnanê û di nava 2015ê de tevlî Rûsyayê ji hevkarên herêmî, hawêrdorî û navneteweyî destekeke giring sitandiye û ev hevkar tev bi hev re nehiştine rejima Esedî bipelişe û şerî li berevajîya dijberan guherandine. Di nava vî şerê tevlîhev û dijwar de çendîn komên kêmanîyên dînî yên wek Durzî, Îsmaîlî, Fileh û Nuseyrî êdî di bîr birine ku êdî rejima Esedî ji bo rêlibergirtina gefên mezhebi yên şiddetê yên komên Îslamîyên radîkal ên hinbihin xurt dibin yekane hêz e.

Piştî ku di nava salên 2011-2014an de komên Îslamî yên radîkal hinbihin xurt bûn, li navenda bakurê Sûrîyeyê di seransera çemê Feratê de bi payîtextbûna Reqayê di nava axa rojhilatê Sûrîyeyê û bakurê rojavayê Îraqê de DAÎŞ peyda bûye. Ji dema ku DAÎŞ-ê di nava 2014ê de "xelîfetî" dîyar kir heta paşîya 2017ê, kontrola xwe ya herêmî bi awayekî mezin ji dest da, wê li herêmên di binê kontrola dezgehê de, tevlî revandin û kuştina bi hezaran Fileh, Êzîdî, Mislimanên Şî'î û heta Mislimanên Sinnî yên li dijî desthilata wan çendîn binpêkirinên azadîya dînî, destdirêjîya cinsî û zordarîyên din kir.

Di dawîya 2018ê de şerê hundirê Sûrîyeyê li herêmên cuda yên kontrolê yên cûrbecûr ên rewşa serbestîya her yekî bi serê xwe ye belav bûye. Rejima Esedî tevlî hevkarên xwe yên herêmî û navneteweyî pirranîya başur, rojava û beşa navîn a welêt xistiye deste xwe û di wan herêman de li ser kesên Mislimanên Sinnî yên texmîna desteka wan ji tevgera dijberan re kiriye bi tundî pê kiriye ser wan. HTŞ û hindiktir jî komên Îslamî yên wek DAÎŞ-ê di serî de xwastin li Îdlîbê û hin herêmên bakur ên bi hev ve negirêdayî, rewşeke gelek zordar a dînî û civatî pêk bînin û ew xistine deste xwe. Sepeya Sûrîyeya Azad (SSA) a hevkara Tirkîyeyê, Efrînê û hin deverên din ên herêma sînorî ya bakur dagîr kiriye, ji bo bidestxistina axa bêtir, carna bi HTŞ-ê re têkoşaye û di heman demê de bi hezaran kesên ji kêmanîyên dînî û nîjadî ji cîhên dijîn dûr kirine. Ji bilî van, Hêzên Sûrîyeyê yên Demokratîk (HSD) û Birêvebirîya Xweser (BX) a bakur û rojhilatê Sûrîyeyê ya bi pirranî Kurd, tevlî hinek sînorkirinan be jî herêmeke wisa kontrol kirine ku tê de Fileh, Êzîdî, Mislimanên Sinnî û komên din dînê xwe bi azadî jîyane.

**Rewşa Azadîya Dînî ya 2018ê**

***Binpêkirinên Rejima Esedî û Komên pê ve Girêdayî:*** Di 2018ê de, hikûmeta Sûrîyeyê, tevlî herêmên ku Mislimanên sinnî pirranîya wê pêk tînin û kelehên dijberan in, li herêmeke mezin a demekê di destê dijberan de bû, ji nû ve bû desthilatdar. Rejim û hêzên hevkar di dema bipêşveçûyînê de dîsa awayên zordest ên tunekirinê bi kar anîne. Li Xûteya keleha Ceyşul Îslama hêza milîs a Îslamî, Sepeya Sûrîyeya Ereb piştî dorpêçeke dijwar a pênc sal dewamkirî û xerakirineke berfireh (tevlî bi tenê li yek herêmekê rûxandina %93yê avahîyan) serfirazîya xwe dîyar kiriye û bi deh hezaran kesên li herêmê dijîn şandiye herêmên bakur ên di destê dijberan de. Di Hezîranê de li bakurê Sûrîyeyê bêtirî 330.000 sivîl, tevlî bajarê Der'aya ku di destpêka 2011ê de serhildêr cara pêşîn li dijî rejimê protestoyên xwe pêk anîbûn û ji ber vî awayî pirr giring bû, berî ku rejim êrîşî wan deran bike dev ji malên xwe berdabûn. Tevlî Nuseyrîyên Sûrîyeyê yên di binê sîwana Hêzên Parastina Neteweyî (HPN)-ê de, Mislimanên Şi'î û mîlîsên din ên herêmî, şervanên biyanî yên Mislimanên Şî'î yên pirranîya wan ji alîyê Yekîneya Parêzkarên Şoreşa Îranê (YPŞÎ) ve ji Efxanistanê, Pakistanê, Îraqê û Libnanê hatibûn anîn, di van êrîşan de tevlî SSE bûne û destekê dane wan û ev awa bûyereke giring e. Komên Eshabûl Ehlûl Heq û Hereketa Hîzbullaha Elnucebaya bi Hêzên Seferberîya Gelê Îraqê ve girêdayî yên di

binê kontrola YPŞÎ-yê de bi SSE-ê re kêmtirî tevgereke 2017ê tevlî sitandina Helebê û navendên din ên bajêran bûne û li Sûrîyeyê tevgera xwe dewam kirine.

Rejima Esedî li herêmên ji nû ve bi dest xistine di proseya ku Mislimanên Sinnî dûr xistiye, sînor kiriye û zordarîyê kiriye de jî, ji bo tevlîkirina kêmanîyên dînî yên wek Durzîyan ên ku heta wê demê alî negirtine jî, sepeyê li wan zordarîyê kiriye. Rejim demeke dîrêj xwastiye Durzîyan ji navenda wan a herêma  Suweyde/Cebeleldurzî-ya başûr ji bo tevlîbûna SSE bikişîne, di encama vê de 30.000 kes mecbûrî xweveşartinê bûne yan ji bo koçberî revîyane Libnanê yan hin cîhên din. Di Temûza 2018ê de di êrîşeke mezin a DAÎŞ-ê ya li ser herêmê de bi bandora vê jidestdayînê bêtir hatiye hisîn, ji ber ku ji bo parastina vê koma ku wek ‘adet ji der ve re girtiye ji alîyê fizîkî ve gelek kêm şervanên têr mane. Di vê navberê de hikûmeta Esedî di Çîrîya Pêşîn a 2018ê de qanûneke nû derxistiye û pê destûreke mezin daye Wezîrîya Ewqafê ku ew hemû karên dîyaneta welêt bi rê ve bibe; ev qanûn dibe ku li Sûrîyeyê li ser jîyana dînî ya Mislimanên Sinnî bandoreke mezin bike. A paşîn, rejim, Mislimanên Sinnî hêdî hêdî ji jîyana tevahî û xanîyan bêtir dûr kiriye, destûrên ku wek ‘adet di destê Mislimanên Sinnî de bûn daye Filehan û Mislimanîn Şî’î, li cîhên li welêt ji nû ve bi dest xistiye xanî û axa Mislimanên Sinnî li şervanên Mislimanên Şî’î par kiriye. Hêzên ewlehîyê yên rejimê nehiştine gelek ji sivîlên Mislimanên Sinnî vegerin malên xwe yên bajarên wek Humusê û qanûnê nû yê dewletê yê tarîxa 2018ê yê jimara 10ê keysa bidestxistina kes û bextxwazên li nav welêt cîh biguhêrin, xanîyên malbatên xwe û milkên xwe ji nû ve bi dest bixin bi awayekî tund sînor kiriye. Welê xuya ye ku ev qanûn nahêle çendîn kesên pirranîya wan Mislimanên Sinnî ne milkên xwe ji dest bidin, nahêle vegerin mal û civata xwe, û bi temamî dev ji vegera welêt ber ‘din; û bi vî awayî nifûsa Sûrîyeyê wek daxwaza rejimê bi temamî ji nû ve şeklê xwe bistîne.

***Binpêkirinên DAÎŞ-ê:*** Di 2018ê de, bi pirranî Hevkarîya Cîhanî ya li dijî DAÎŞ-ê (HCDD), HSD-a bi desteka DY ya bi pirranî ji Kurdan pêkhatî û kêmtir jî SSE hevkarên wê dewamî ji DAÎŞ-ê azadkirina axa Sûrîyeyê bikin û di encama vê yekê de hema hema 14.000 şervanên DAÎŞ-ê yan xwe veşartine yan jî xwe avêtine herêmên hinbihin teng dibin. Lêbelê di seransera dewra raportkirinê de şervanên DAÎŞ-ê yên ketine binê erdê û hêzên wan ên li nêzî Hacînê mayî yên şer dikin, hem ji bo sivîlên Sûrîyeyê û hem jî ji bo hêzên HCDD û HSD-ê bi awayekî xuyayî û eşkere xeter bûne. Di 2015ê de di dema êrîşa DAÎŞ-ê de kêm ji 9.000 Filehên Asûrî yên ji wîlayeta Hesiçayê revîyayî vegerîyane û bi qedera hema hema 25 Filehên ji alîyê DAÎŞ-ê ve di wê proseyê de revandî jî nayê zanîn. Herweha nayê zanîn ka Peder Paolo Dall’Oglio-yê keşeyê Cizvît ê Îtalyan, Serekpîskoposê Yûnan ê Helebê Paûl Yazîgî, keşeyê katolîk ê Ermenî Peder Mîchel Kayyal û keşeyê Ortodoks ê Yûnan Peder Maher Mahfouz ê DAÎŞ-ê ew revandine li ku derê ne.

Di Temûza 2018ê de şervanên DAÎŞ-ê di ser keleha vê dezgeha terorîst a çola Elbedîyeyê re bi ser komên Durzî yên Suweydeyê ve êrîşên herî kujer ên heta wê demê pêk anîne û li gora hatiye zanîn, bêtirî 300 Durzîyan bi bombekirinê, bi lêxistina bi çekan yan bi kêrkirinê kuştine. Ji bilî

van; 20 jin û 16 zarokên Durzî revandine lêbelê ji van -ji bilî didoyên di dema dîlbûnê de mirine- paşê bi bazarkirinê, fîdyeyê û bi hev guherandina girtîyan serbest hatine berdan.

***Binpêkirinên Komên Dijber ên din ên Îslamxwaz û ne Îslamxwaz:*** Dema ku gefa DAÎŞ-ê kêm bû, azadîya dînî, xasma li wîlayeta Îdlîba bakurê rojava Elqa'îde û dîsa xasma 'Efrîn û beşên din ên herêmên nava bakur û bakurê rojhilat ketiye binê gefa komên dijber ên Îslamî yên bi Tirkîyeyê ve girêdayî. Hêzên Îslamxwaz ên binê sîwana HTŞ-ê yên Cebheya Elnusraya bi Elqa'îdeya li dijî kêmanîyên dînî serbuhurîya wê ya tundîyê ya gelek tarî heyî, li wîlayeta Îdlîba ji destê komên dijber ên reqîb sitandî, hema hema bi awayê xistina nav xwe ya komên dijber an ên ji hole rakirî bûne desthilat û hinbihin roleke mezin leyîstine. HTŞ li dijî reqîbên xwe yên sunnî tevgerên şiddeta siyasî yên wek girtin û revandinê bi awayekî berfireh bikar anîye, li cîhên gelî raveyeke qanûnê Îslamî yê binavkirina hemû îfadeyên ji bilî Îslamê qedexe kiriye. Li gora tê gotin, kom, ji bilî van, kempeyneke destdanîna ser xanî û milken Filehan daye destpêkirin: di Çirîya Paşîn a 2018ê de li gora bêtirî yek xeberî, HTŞ, bi malbatên fileh ên jimara wan nayê zanîn daye zanîn ku ew raportê bidin "Birêvebirîya Milkên Şerî û Xenîmetan", ango xwastiye dest dayne ser malen wan. Ji wê demê ve pirranîya malbatên Fileh ji herêmê revîyane. Li gora haydarîyan, car caran HTŞ ji bo ji karbidestan hatinîyê bi dest bixe, yekser dest danîye ser dikan û xanîyên Filehên xwedanmilk. Tevlî zehmetîya teqezîya belgeyên gelek ji van bûyeran jî, ev xeber li Sûrîyeyê ji bo kêmanîyên nîjadî û dînî rewşa jixwe xerab bûye xerabtir kiriye û kiriye kû kesên revîyayî êdî nexwazin vegerin mal û cîhên xwe yên perestinê.

Li herêma 'Efrîna ku demekê Mislimanên Kurd, Asûrîyên Fileh û Êzîdî bi awayekî çendreng bi hev re dijîyan de, rewşa azadîya dînî gelek xerab bûye. Di nava Çileyê Paşîn û Adara 2018ê de hêzên Tirk û hevkarên wan ên 'Ereb û Tirkmen ên di nava Sepeya Sûrîyeya Azad (SSA) de ji bo ku dest daynin ser herêma di destê hêzên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) a Kurd, tevgereke bi navê "Tevgera Şaxa Zeytûnê" dane destpêkirin. Li ser vê êrîşê 137.000 kes ji malên xwe revîyane û xwe avêtine herêma di binê kontrola HX û parastina HSD-ê de. Li gora danzanînan, 400 Kurdên bûne Fileh ên ji komên Îslamî yên SSA-yê tirsîyane jî di nava koma bextxwaz de bi cîh bûne. Her çend hin ji van bextxwazan xwastine di 2018ê de vegerin 'Efrînê jî hêmanên SSA-yê dest danîne ser milkên wan yan ew xera kirine û gelek ji xanîyan li bextxwazên Mislimanên Sinnî yên ji destê tevgera rejimê ya berî çend hefteyan ji nû ve bidestxistina Rojhilatê Xuteyê revîyayî, belav kirine. Li gora danzanînan, hêmanên Îslamxwaz ên nava SSA-yê ji bo ku li herêmê paqijîya nîjadî pêk bînin bi rêyên wek yên DAÎŞ-ê abîdeyên Kurdan û Êzîdîyan, perestingehên Mislimanên Sofî û Nuseyrîyan, goristanan û cîhên din ên pîroz rûxandine. Li gora komên parastina azadîya dînî, şervanên SSA di Hezîrana 2018ê de li 'Efrînê ji bo bikaranîna wek biryargeh, dest danîne ser dêrekê, hin ji wan jî dêreke din şewitandine û kavilên wê bi nivîsên dîwarî yên Îslamî xemilandine.

***Rewşa li Herêma Xweser a Bakurê Rojhilat:*** BX li herêma di destê xwe de bi pirranî rewşa azadîya dînî ya erênî pêk anîye, destûr daye ku Misliman, Fileh û komên din bawerîya xwe

eşkere bijîn û bidin der û Misliman di derbasbûna dînên din de azad bin û hemû welatî azadîya xwe ya bêbawerîyê û Xwedênenasîyê hebin. Nûnerên kêmanîyên dînî û nîjadî yên li herêma xweser dijîn ji USCIRF-ê re gotine ku hem tecrîbeyeke bextxwazîya ewle kirine û hem jî tevlî dezgehên birêvebirîya herêmî ya wek Encûmena Demokratîk a Sûrîyeyê bûne ku azadîya pirr a dînî û wekhevîya cinsî tê de heye. Yek ji teşqeleyên herî kêm, lihevnekirineke di nava desthilatên Kurd û komên Fileh de li ser bernameya xwandingehan e (mijareke qayîşkêşanê ya demeke dirêj e dewam dike li ser sînorên nasnameya nîjadî, dînî û neteweyî ye) û li gora danzînanan, dema ku desthilatdarên Kurd di Tebaxa 2018ê de bi egera ku ew ji bernameya ji alîyê HX ve pejirandî re erê nekirine fermana girtina hema hema 20 xwandingehên Asûrî û Ermenîyan kirine, ev teşqele gihîştiye asta herî bilind. Li ser vî awayî birêvebirên xwandingehan û çalakvanên Fileh di paşîya Tebaxê de derketine kuçeyên wîlayeta Hesiçayê û van girtinan protesto kirine û bi hinceta ku bernameya ji alîyê BX ve bi zorê dixwaze bi wan bê kirin nasnameya wan a nîjadî û dînî nas nake û di şûna rejima tûj a Be’sî ya Esedî de qadeke nîjadperestîya Kurdî dixwaze pêk bîne, gazin kirine. Dîsa jî, eger têkoşînên destûrdarên herêmî yên bi salan dewam dikin ji ber dagîrkerîyereke mezin î Tirkan yan terora DAÎŞ-ê têk neçe, îsbatên xurt hene ku bakurê Sûrîyeyê ji alîyê belavkirina azadîya dînî û parastina wê ve her çend bêkêmasî nînbe jî bi awayekî mezin modêleke erênî nîşan dide.

**Siyaseta DY**

Bûyerên cûrbicûr ên heta paşîya 2018ê bi nimûneyên DY yên siyaseta azadîya dînî ya Sûrîyeyê ve têkildar in. Berî her tiştî HSD di sere meha Çileyê Pêşîn de bajarê Hacînê bi serfirazî bi dest xistiye û ev serfirazî kiriye ku yek ji herêmên paşîn ên di binê kontrola DAÎŞ-ê de jî ketiye. Di paşîya dewra raportkirinê de li Hacînê û dora wê, di nava HSD û mayîyên DAÎŞ-ê de şerê dijwar dewam dikir lê bi serfirazî bidestxistina bajêr nîşan daye ku HCDD û bi taybetî nîvekarên wê yên HSD-yî di seransera sala 2018ê de biserketina herî bilind a tunekirina keysa tevgera DAÎŞ-a Sûrîyeyê û Îraqa cîranê wê nîşan daye. Lêbelê ji ber ku hê jî çendîn şervanên Îslamîxwaz ên tûj li wê derê tevdigerin, gencîneya DAÎŞ-ê heye ku ji alîyê îdeologîk ve wan ber bi xwe ve bikişîne û dîsa bîne ser hêza berê. Piştî bidawîhatina dewra raportkirinê xuya ye ku siyaseta DY dîsa li Sûrîyeyê li ser bandora Îranê kûr bûye, ji bilî vê yekê taybetîya sereke ya sala 2018ê têkçûna DAÎŞ-ê û bidawîanîna gefa wê ya tovkujîyê ya li ser Filehên Sûrîyeyê û Îraqê, Êzîdî, Mislimanên Şî’î û komên dînî û nîjadî yên din e.

Serek Donald J. Trump di 11ê Çileyê Pêşîn de Qanûnê Xelaskirin û Berpirsîya ji Tovkujîya Îraq û Sûrîyeyê (P.L. 115-300) yê bi tarîxa 2018 îmze kiriye ku tê de gotiye “DAÎŞ ji tovkujîyê, sûcên dijî mirovahîyê û ji zordestîya ser komên nîjadî û dînî yên wek Filehên Îraqê, Êzîdîyan û Mislimanên Şî’î berpirsîyar e. Ev qanûn berê hikûmeta DY daye wî alîyî ku ew alîkarîya “pêdivêyên mirovahîyê, îstîqrara û çêtirkirina” wan koman bike û hikûmet û dezgehên civata sivîl destekê bidin têkoşînên berpirsîyarîya gunehbarkirina endamên DAÎŞ-ê. Xasma li berevajîya Îraqa ku Dewletên Yekbûyî bi birêvebirên dewletê, destûrdarên herêma Kurdan û

dezgehên civata sivîl re têkilîyên xwe yên xurt hene, di mijara Sûrîyeya ku zûzûka diguhere de çarçoveya pêkanîna vê alîkarîyê di paşîya dewra raportkirinê de hê eşkere nebûbû. Lêbelê hêvî ew e ku qanûnê tarîxa 2018ê di paşîyê de endamên DAÎŞ-ê bike berpirsîyar û ji bo komên dînî û nîjadî yên Sûrîyeyê rêyeke alîkarîyê û dermankirinê peyda bike.

Tevlî vê yeke Serek Trump di 19ê Çileyê Pêşîn de da zanîn ku dile wî heye ew hemû yekîneyên DY yên enîya Sûrîyeyê demildest bi paş ve vekişîne û têkçûyîna xuyayî ya DAÎŞ-ê wek paşîya hebûna DY ya wê derê dîyar kiriye. Ev danzanîn bûye sebebê lihevketinike zû ya ku tevlî ‘Ereb, Kurd û Tirkan, di nava komên çekdar de hêzên eskerî û aborî yên bakurê rojhilatê Sûrîyeyê ji nû ve werin dan û sitandin û werin biserûberkirin. Piştî dewra raportkirinê, di Sebata 2019ê de Koşka Sipî da zanîn ku dê 200 wezîfedarên eskerî yên DY wek perçeyek ji hêza çavdêrîya pirrneteweyî, li herêma bakurê rojhilat dê dewam bike bibe alîkarê HSD-ê û dê 200 wezîfedarên din jî li bakurê rojhilatê Sûrîyeyê li herêma Tenfa nêzî sînorê Îraqê û Urdunê bimînin.

Bivênevêya vekişîna wezîfedarên eskerî yên DY kiriye ku kêmanîyên dînî û nîjadî endîşeyeke xwe ya mezin heye ku dê Tirkîyeya ku dixwaze koka YPG-a bi Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) ve girêdayî bibirîne, valahîyeke eskerî ya nû ya bivênevê bi kar bîne û êrîşeke berfireh bibe ser herêma di destên Kurdan de. Nûnerên hin ji van koman ji endamên cûrbicûr ên çapemenîyê û USCIRF-ê re yekser gotine ku eger tevgereke weha rû bide, ew ditirsin ku tevgerên Tirkîyeyê yên li ser ‘Efrînê di encamê de bibin tofaneke mezin: Pirrbûna komên Îslamîxwaz ên tûj ên SSA, li wê herêmê hemû jidestçûyîna bipêşveçûnên rewşa azadîya dînî, di binê guleyên çeperast de mayîna bi dehhezarê sivîlan, keysa ji nû ve xwebirêxistina DAÎŞ-ê, dîsa jicîhêxwebûna kêmanîyên bêparastin ên Sûrîyeyê.